# Teqrîz û Teqrîza Xelîfe Yûsif di Wêjeya Kurdî ya Klasîk de

## (Takriz and Khalifa Yusuf's Takriz in Classical Kurdish Literature)

**Hasan Akboğa* & Ömer Delikaya****

**Kurte**

Teqrîz rêgezeke balkêş e ku ji aliye nivîskar an jî helbestvan ve di destpêka berhemê de wek kurteyekî, bi armanca pesnê berhemê tê nivîsandin û di serê berhemê de cih digire. Ango teqrîz pesin û medhiyeya wê berhemê ye. Teqrîz li gor lêkolînên hatine kirin, li ser van cureyên wêjeyî hatiye nivîsandin; dîwan, mesnewi, rojname, kovar, tezkîre, ferheng, şîretname, sakînâme, sûrnâme, nasihatnâme, menâkibnâme. Her wiha li ser pirtûkên wek roman, dîrok, belaxat û hwd jî teqrîz hatine nivîsandin. Di wêjeya zimanên cînarê kurdî de, ango di 'erebî, farisî û tirkî de *teqrîz* wek binbeşeke wêjeya klasîk cihê xwe girtiye. Her wiha *teqrîz* hem menzûm hem jî nesîr bûye du şaxan. Di edebiyata kurdî ya klasîk de her çiqas hin malikan de pesnê helbestvan û berhema wî derbas bibe jî, me heta niha nedîtiye ku dîwanek bi rek û pek li ser pesnê berhemên nivîskarekî hatibe honandin. Bi her awayî *Teqrîza Xelîfe* qada xwe de awarte ye. Teqrîz hem li gor rêgeza xwe nehatiye saz kirin ku divê wek kurteyekî bihata nivîsandin û li ser berhemekî tenê bihata amade kirin; hem menzûm e ku ev cure di wêjeya kurdî ya klasîk de tuneye; hem jî ji aliye nivîskar bi xwe û wek dîwaneke berfireh hatiye nivîsandin. Wek rêbaz me xwe sparte metnê teqrîzê û zêdetir me ji gotar û pirtûkan sûd wergirtin ku di vî warî de hatine amadekirin. Ji bilî berhemên Xelîfe yên din me dîwanên kurdî yên klasîk di vê çarçoweyê de raçav kirin.Her wiha em ê li ser jiyana nivîskar û berhemên wî jî rawestin. Ji ber ku Xelîfe xeleqa dawî ya Ekola Ehmedê Xanî ye û hişmendiya xwe ya kurdînûsîyê jî Xaniyê gewre girtiye.

**Peyvên Sereke:** Wêje, Wêjeya Kurdî ya Klasîk, Teqrîz, Xelîfe Yûsif, Dîwan.

*Zanîngeha Çewlîgê, Enstîtuya Zimanên Zindî, Şaxa Makezanista Ziman û Wêjeya Kurdî, Xwendekarê Lîsansa Bilind a Bitez. akbogahasann@gmail.com
**Zanîngeha Çewlîgê, Enstîtuya Zimanên Zindî, Şaxa Makezanista Ziman û Wêjeya Kurdî, Xwendekarê Doktorayê. omerdelikayaa@gmail.com